Zeytin Timleri askeri olmasına rağmen Kürt vatandaşlara insani yardım ve destek sağladılar.

Olive (Zeytin) Hastanesi askeri bir hastaneydi evet bu doğru ama kapılarını vatandaşlara hep açtı ve tedavi hizmeti veriyordu. Akabinde Şehit Sami Abdulrahman Park'ta bir kütüphane açtılar ve birçok bakanlık ve kurumla işbirliği yaptılar. Ekibin askerleri vatandaşlarla dostane ilişkiler kurarak Kore kültürü ve geleneklerini Kürt halkına tanıttı. Birçok Kore hikayesi ve dizisi Kürt izleyiciler arasında oldukça popüler hale geldi.

KOICA ajansı Kürdistan Bölgesi'ne pek çok hizmetlere imza attı ve hizmet etmeye devam ediyor. 60'dan fazla okul, 15'e yakın sağlık merkezi, hastane ve kütüphanenin inşasında önemli rol oynadılar. Kürdistan Kamu Yönetimi Enstitüsü'nün kurulmasına ve Elektronik satın alma sisteminin kurulmasına ve etkinleştirilmesine yardımcı oldular.

Yirmi yıl sonra, bugün Koreli dostlarımızın Kürdistan Bölgesi'ndeki birçok farklı alandaki rolü, etkisi, varlığı ve parmak izleri açıkça görülüyor. Onlar bizim sadık ve çok iyi dostlarımızdı ve onların

tüm yardımlarına minnettarız.

Kore'ye ilk ziyaretime dair hoş anılarım var. Seul havaalanında güzel Kürtçeyle karşılandığımız sıcaklığı ve samimiyeti hiçbir zaman unutmayacağız. Şu anda bile bu önemli başlangıcın 20. yılını anarken, Güney Kore, halkı, kültürü ve nüfuzu Kürt halkı tarafından çok iyi bilinmektedir.

Güney Kore, Zeytin Timi, KOICA Ajansı ve Koreli şirket ve ortaklarımızın burada sağladığı ve yapmakta olduğu birçok çalışma ve hizmetle iki ülke arasında hâlâ güçlü bir dostluk bağı devam ediyor.

Biz Kürdistan Bölgesi olarak bu ilişkilerden büyük mutluluk ve gurur duyuyoruz. Aramızdaki tüm alanlarda ortak çıkarılara dayalı işbirliğini daha da genişletmeye ve geliştirmeye hazırız.

Güney Kore'nin benzersiz başarı öyküsü tüm dünya için oldukça ilginç ve ilham verici. Kürdistan Bölgesi ve Irak bundan pek çok yararlı ders çıkarılabilir. Kore, savaşın ardından yaşanan yıkımdan ve kötü ekonomik şartlardan dolayı acılar çekti, ancak uluslararası yardımla insanları ve altyapıyı yeniden inşa etmeye odaklandı.

Stratejik planlama, inisiyatif ve inovasyonun bir sonucu olarak Kore, dünyanın on dördüncü büyük ekonomisi haline geldi. Teknolojinin en güçlü yeteneklerinden biri haline gelen Güney Kore

dünya çapında teknoloji ve bilimin ilerlemesine damgasını vurdu.

1971'de savaştan sonra Güney Kore'nin yaptığı en akıllıca şeylerden biri Kore Kalkınma Enstitüsü'nü kurmaktır. Enstitü, Kore halkının ve toplumunun yeniden canlandırılması, geliştirilmesi, ekonomik ilerlemesi ve yeniden inşası için politika ve stratejileri başarıyla formüle etti.

Yıllar sonra enstitünün çalışmalarının Kore'nin ekonomik büyümesi üzerinde derin bir etkisi oldu. Kürdistan Bölgesi'nin durumuna ve ihtiyaçlarına göre onların tecrübelerinden yararlanabilir ve bunu burada uygulayabiliriz."

Kore ile ortaklığımızı pekiştirmeye kararlı olduklarını ifade eden Başkan Neçirvan Barzani, "Kürdistan Bölgesi, Kore özel sektörü için tüm sektörlerde uygun bir yatırım ortamına ve iyi fırsatlara sahip olduğunu hatırlatmak isteriz. Bilim, teknoloji, kültür ve daha birçok alanda işbirliği yaparak Kürdistan Bölgesi'nin altyapısının geliştirilmesinde daha da etkili olabilirler. İlişkilerimizin ufkunu her iki tarafın yararına çok daha geniş ve kapsamlı olabilir ve bunu da sürdürebiliriz" diye konuştu.

Neçirvan Barzani, konuşmasının sonunda Kürdistan Bölgesi'ndeki hizmetlerinden dolayı Zeytin Timleri'ne ve Güney Kore yetkililerine teşekkür etti.

Nêçîrvan Barzanî: Koreya Başûr dostê me yê dilsoz e



Serokê Herêma Kurdistanê di pîrozbahîya 20emîn salvegera destpêkirina pêwendiyên Herêma Kurdistanê û Koreya Başûr de got, "Koreya Başûr dostê me yê dilsoz û gelekî baş e."

Grûpa Zeytûnê ya artêşa Koreya Başûr sala 2004an hat Herêma Kurdistanê.

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî beşdarî çalakiya

pîrozbahîya 20 saliya hatina Grûpa Zeytûnê ya artêşa Koreya Başûr a Herêma Kurdistanê bû.

Pîrozbahî ji aliyê Konsulxaneyê Koreya Başûr a Herêma Kurdistanê ve hat lidarxistin.

Nêçîrvan Barzanî di gotara xwe de li ser 20 saliya pêwendiyên Koreya Başûr û Herêma Kurdistanê got:

"Koreya Başûr dostê me yê dil-

soz û gelekî baş bû û em spasiya hemû hevkarî û alîkariyên wan dikin."

Di pîrozbahiyê de gelek berpîrsên hikûmetê, dîplomat û kesayetiyên navdar amade bûn.

Serokê Herêma Kurdistanê ragihand ku piştî derbasbûna 20 salan di ser pêwendiyên Herêma Kurdistanê û Koreya Başûr re heta niha jî dostaniyeke bihêz di navbera her du aliyên de heye.

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî her wiha anî ziman:

"Hatina Grûpa Zeytûnê destpêka vekirina nûnertiya Koreyê ya li Herêma Kurdistanê bû ku ji ofîsa dîplomasî ya Balyozxaneyê sala 2016an veguherand asta konsulxaneyê." Konsulê Koreya Başûr ê Hewlêrê Seungcheol Lim jî di pîrozbahîya 20 saliya pêwendiyên Herêma Kurdistanê û Koreya Başûr de strana "Baran baran e" stran.

Pizîşkiyan: Kurd bi xetekê ji hev hatine veqetandin

Serokkomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan behsa Kurdên parçebû-

van Barzanî re bicive. Mesûd Pizîşkiyan li ser ziyareta



na Kurdistanê kir û eşkere kir ku Kurdên her du aliyên bi xetekê ji hevdu hatine veqetandin. Serokkomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan îro hat Bexdaya paytexta Îraqê û bi Serokkomarê Îraqê Letîf Reşîd, Serokwezîrê Îraqê Mihemed Şiya Sûdanî re civiya.

Biryar e, sibehê Mesûd Pizîşkiyan were Hewlêrê û bi Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîr-

xwe ya bi Herêma Kurdistanê re ji "Malpera Dr. Pizîşkiyan" re axivî.

"Em birayên hevdu ne"

Pizîşkiyan amaje bi Kurdên Rojhilatê Kurdistanê û Herêma Kurdistanê kir û wiha got:

"Li her du aliyên sînora şênîyên me yên Kurd hene. Em hemû wekî hevdu ne. Tenê xetek kişandine û ew ji hevdu veqetandine da ku şer durist bikin.

Şerê me nîne û em di peywendiyê de ne. Belûcên wî alî û Belûcên wî alî jî bi hev re di pêwendiyê de ne. Em bi hev re birayên hevdu ne."

Di berdewamiyê de Mesûd Pizîşkiyan behsa pêwendiyên Îranê yên bi welatên cîran re kir û wiha got:

"Di navbera me û cîranên me de pêwendiyên mervantiyê hene û nabe ew li ber çavan neyê girtin.

Ev derfetek e û em dikarin vê ji bo geşepêdana pêwendiyên bikar bînin wê demê dê jiyana xelkê me yê her du aliyên jî ber bi başiyê ve biçin."

Pizîşkiyan li ser pêwendiyên û dîplomasiyê wiha axivî:

"Bi awayekî rast ê bikaranîna derfetan, aborî dê mezintir bibe, hêza civakî û siyasî dê zêdetir bibe, tecrûbe dê werin veguheztin û siyasî dê bêne hevrêz kirin.

Em dikarin sûdê ji wan derfetan werbigirin û ev yek dikare bandorê li rewşa xelkê her du aliyên sînora bike."

Serokkomarê Îranê bi kurdî: Em ji bo çareserkirina pîrsgirêkan hatine Hewlêrê

Serokkomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan tekezî li ser pêşxistina pêwendiyên bi Herêma Kurdistanê re kir û got, ew ji bo çareserkirina pîrsgirêkan helawîstî hatine Hewlêrê. Serokkomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan îro 12ê Îlonê gihîşt Herêma Kurdistanê û li Serokatiya Herêma Kurdistanê, bi Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Serokwezîr Mesrûr Barzanî re civiya. Piştî jî bi awayekî cuda bi Serok Mesûd Barzanî re civiya.

Piştî hevdîtina; Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Serokkomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan bersiva çend pîrsên rojnamevanan dan.




Pizîşkiyan derbarê armanca serdana xwe bo Hewlêrê de bi Kurdî ji rojnamevanan re got: "Em hatine ji bo baştirkirina peywendiyên xwe bi Iraq û Herêma

Kurdistanê re." Herwiha Serokkomarê Îranê got jî: "Piştî Xwedê em ê hemû pîrsgirêkan ku heta niha hebûn, bi temamî ji holê rakin."

Serok Barzanî pêşwazî li Serokomarê Îranê kir

Îro 12.09.2024ê Serokomarê Îranê geheşt Hewlêrê û ji aliyê Serokê Herêma Kurdistanê



Nêçîrvan Barzanî ve pêşwazî lê hate kirin.

Serokomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan piştî geheşt paytext Hewlêrê li gel Serokatiya Herêma Kurdistanê, Serokatiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê civîn pêkanîn.

Herwaha Serokomarê Îranê Pizîşkiyan naha jî li gel Serok Mesûd Barzanî di civînê de ne û dê hin mijarên giring bînin gotûbêj kirin.

Biryarê îro li Hewlêrê Serokomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan li gel beşek ji aliyên siyasî jî bicive û behsa bihêzkirina peywendiyên di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê û herwaha behsa danûstana bazirganî yên di navbera herdu aliyên de û hin mijarên din jî gotûbêj bike.

Sînora Gelawêj: Serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' rêya rizgariyê ye

Endama Konseya Rêveber a KJARê Sînora Gelawêj destnîşan kir ku serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' ji bo jinan rêya rizgariyê ye.



Endama Konseya Rêveber a Komelgeha Jinên Azad ên Rojhilatê Kurdistanê (KJAR) Sînora Gelawêj têkildarî serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' ji JIN TV re axivî.

Sînora Gelawêj anî ziman ku dewleta Îranê gel weke berpîrsyarê krîza siyasî, civakî û aborî dibîne, lewma bi her awayî êrîş dibe û got, bi taybetî tevîbûna jinan a li nava jiyana asteng dibe, jinan ji qadên civakî, jiyana û siyasî dûr dixîne.

Sînora Gelawêj anî ziman ku dewleta Tirk dixwaze jinan îzole bike, pîrsgirêka jinê veguheriya girêka kor û got, "Ji aliyekî ve civak bi hemû hêza xwe êrîş dibe, li aliyê din jî jin li hemberî wê yekê têkoşîna xwe dewam dibe." Sînora Gelawêj destnîşan kir ku serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' hêviya jinan a ji bo rizgariya ji krîza civakî, siyasî û aborî ya 40 salan e û diyar kir, ku ji ber wê yekê jin bi rengê gelekî xurt tevî serhildanê bûn.

Sînora Gelawêj ragihand ku rejîm olê weke çekekê li dijî civakê bi kar tîne û bi gotina 'dijberiya li ol' dewlet wî mafî bi xwe re dibîne ku her cûre darizandinê bike.

Sînora Gelawêj got, "Rejîma Îranê ji bo dengê azadiyê yê berxwedêr û muxalîfan bitepisîne sêdare her tim weke amûrekê bi kar anî" û destnîşan kir ku civak li hemberî wan zextan ti carî tîk neçûye.

Sînora Gelawêj kampanya 'Na ji darvekirinê re, erê ji jiyana azad re' ya KJAR û PJAKê bi bîr xist ku dema dawî li hemberî zext û darvekirinê dan destpêkirin û got, bi wê kampanyayê re ji bo karibin dengê azadiyê li her deverê belav bikin wê têkoşinê li nava girseyên berfireh belav bikin.

Sînora Gelawêj destnîşan kir ku li gel zext û êrîşan jî jinan ti carî dest ji têkoşinê bernedane û got, "Mîna ku Rêber Apo got, ev sedsal wê bibe sedsala azadiya jinê. Nîşaneyê herî mezin a wê yekê jî serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' ya li Rojhilat e."

Serok Barzanî: Şoreşa Îlonê doza Kurdan gihand cihanê

Serok Barzanî diyar kir ku Şoreşa Îlonê doza neteweyî ya istin. "Heta Pêşmerge hebin Kurdis-



Kurdan gihandiye cihanê.

Serok Mesûd Barzanî tevî 63yemîn merasîma bibîranîna Şoreşa Îlonê bû û di merasîmê de gotarek pêşkeş kir.

Serok Barzanî xwest ku xelkê Herêma Kurdistanê û aliyên siyasî vegehin ruhê serdema Şoreşa Îlonê û Raperîna sala 1991ê.

Serok Barzanî di berdewamiya axavtina xwe de got:

"Em bi hev re dikarin gelek destkeftiyên mezin bi dest bixin."

Merasîma bîranîna Şoreşa Îlonê li Çiyayê Sefînê hat lidarx-

tan di destên ewle de ye"

Serok Barzanî di gotara xwe de behsa rola Şoreşa Îlonê ya di doza neteweyî ya Kurdan de kir û got: "11ê Îlonê rojêke pîroz e, Şoreşa Îlonê şoreşek e ku doza gelê Kurdistanê gihand hemû cihanê û deriyekî fireh ji hemû Kurdistanê re vekir û berhema wê jî hebû.

Dîsa 11ê Adara 1970an bi xwîna Pêşmergeyên qehreman destkefteke mezin ji bo gelê Kurdistanê hat bidestxistin.

Em bi hev re dikarin gelek

destkeftiyên bi dest bixin û divê em spasiya Xwedê bikin ku îro em bi amadebûna van hêjayan, Şoreşa Îlonê bi bîr tînin. Sefîn alayeke bilind e di dîroka gelê Kurdistanê de.

Me ev îrade ji Şoreşa Îlonê wergirtiye û heta em sax bin jî ev îrade dê bimîne.

Heta ku ev Pêşmergeyên qehreman hebin, Kurdistan di destên ewle de ye û roj bi roj dê pêşketinên mezin pêk werin."

Serok Barzanî li ser Çiyayê Sefînê axivî û amaje bi helbesteke Hejar Mukriyanî kir.

Serok Barzanî di berdewamiya gotara xwe de hêviya serkeftin û pêşketina Kurdistanê xwest.

11ê Îlona 1961ê artêşa Îraqê li herêma Bazyan, Geliyê Xelkan û li sînorê Dihokê dest bi êriş û bombebaran kirin.

Her wiha 19ê Îlonê Ofîsa Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) jî li hemberî êriş û bombebaran biryara parastinê da. Bi rêbertiyê Mele Mistefa Barzanî meha Îlona 1961ê li dijî artêşa Îraqê şoreşê dest pê kir.

Şoreşê heta Peymana Ceza-yîrê ya sala 1975an berdewam kir.

Nêçîrvan Barzanî: Axa me nabe çavkaniya metirsiyê

Nêçîrvan Barzanî got, "Herêma Kurdistanê ti carî nabe çavkaniya metirsiya li ser Îran û



welatên cîran." Serokkomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan doh çûbû Bexdaya paytexta Îraqê û bi Serokkomarê Îraqê Letîf Reşîd, Serokwezîrê Îraqê Mihemed Şiya Sûdanî re civiyabû.

Mesûd Pizîşkiyan vê sibehê li Balafirgeha Navneteweyî ya Hewlêrê ji aliyê Nêçîrvan Barzanî ve hat pêşwazîkirin. Pizîşkiyan destpêkê li Ofîsa Serokê Herêma Kurdistanê bi Nêçîrvan Barzanî û Kabîneyê re civiya. Serokkomarê Îranê paşê bi Serok Mesûd Barzanî re jî civînek kir.

Serokkomarê Îranê piştî temasên li Hewlêrê derbasî Silêmaniyê bû û ji aliyê Serokê Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) Bafil Talebanî ve hat pêşwazîkirin. Serokatiya Herêma Kurdistanê li ser hevdtîna Nêçîrvan Barzanî û Pizîşkiyan daxuyaniyeke nivîskî da.

Serokatiyê diyar kir ku Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, Wezîrê Karên Derve yê Îraqê Fuad Husên û Alîkarê Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Qubad Talebanî jî beşdarî civînê bûne. Nêçîrvan Barzanî kêfxweşiya xwe ya ji bo vê serdanê nîşan da û diyar kir ku ev serdan wekî peyameke bihêz a dostaniya her du welatan e.

"Gelê Kurdistanê her tim rêz û hurmetê lê digire"

Barzanî xwesteke Herêma Kurdistanê ya ji bipêşxistina pêwendiyên û berfirehkirina hevkarîyên her du aliyên anî zimên û bal kişand ser wê yekê ku "Gelê Kurdistanê her tim rêz û hurmetê li piştevanî û hevkarîyên Îranê yên di rojên dijwar de digire."

Li hêla din, Pizîşkiyan jî kêfxweşiya xwe ya ji ber vê ziyaretê anî zimên û diyar kir ku Îran girîngiyê bi pêwendiyên xwe yên bi Îraq û Herêma Kurdistanê re dide.

Serokkomarê Îranê her wiha amaje pê kir ku Îran dixwaze di hemû waran da pêwendiyên xwe yên li gel wan baştir bike û pirsgrîk û astengiyên li ber pêwendiyên jî holê rake.

Her du aliyên pesnê "pêwendiya dostane û kevna a Îran û Herêma Kurdistanê" da û behsa berfirehkirina derfetan hat kirin.

"Herêma Kurdistanê ti carî nabe çavkaniya metirsiyê"

Serokê Herêma Kurdistanê diyar kir, "Herêma Kurdistanê ti carî nabe çavkaniya metirsiyê li ser Îran û welatên cîran." Nêçîrvan Barzanî amaje bi peymanên ewlehiyê yên Îran û Îraqê jî da û zelal kir ku Herêma Kurdistanê pêbendî van peymanan e. Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî û Serokkomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan piştî vê civînê bi nûnerên dîn û neteweyên cuda re civiyan.

Di vê civînê de jî behsa pirrengî û dewlemendiya çandî, neteweyî û dîni ya li Herêma Kurdistanê hat kirin.

Mesrûr Barzanî bi mezinên cîhanê re tevî Konferansa COP29ê dibe

Lihevkirina li ser armanceke nû ya darayî ji bo alîkarîkirina welatên nûgehiştî ji bo xweguncandinê bi rengvedanan re, mezintirîn erkê Konferansa Guherîna Keşûhewayê ya Neteweyên Yekgirtî (COP29) ye, ku biryar e li Mijdara îsal li Bakuyê, Paytexta Azerbaycanê bê lidarxistin. Serokwezîr Mesrûr Barzanî îro 10ê Îlonê pêşwazî li Balyozê Azerbaycanê li Îraqê Nasir Memmedov kir.

Di hevdtînê de, Balyozê Azerbaycanê silavên Serokkomarê Azerbaycanê gihandin Serokwezîr Mesrûr Barzanî û ew vexwendibû Lûtkeya Cîhanî ya Keşûhewayê (COP29) ku biryar e meha Mijdarê li Bakuyê bê lidarxistin.

Nameyek ku roja Pêncsemî 29ê Tebaxa 2024an ji aliyê Komîsyona Guherîna Keşûhewayê ya Neteweyên Yekbûyî ve hatibû weşandin, heft bijare li xwe girtibû, ku helwestên cuda yên welatan ji bo gihîştina lihevkirineke muhtemel di dema konferansê de nîşan dide.

Li gorî Reutersê, finansmana nû ya armanckirî tê pêşbînîkirin ku şûna pabendbûna heyî ya welatên dewlemend bigire ku salê 100 milyar dolar ji welatên pêşkeftî re ji bo encamên guherîna keşûhewa peyda dike.

Welatên nû pêşkeftî yên armanckirî ku budcê zêdetir ji 100 milyar dolarî be, lê welatên bexşîner, mîna Kanada û

Yekîtiya Ewropî, dibêjin budceyên wan ên neteweyî kêmbûne.

Tê pêşbînîkirin, heta sala 2050î zêdetirî 14 milyar mirov bi sedema qeyrana keşûhewayê



canê xwe jidest bidin.

Serokê COP29 û Wezîrê Jîngeh û Çavkaniyên Xwezayî yê Azerbaycanê Muxtar Babayev di daxuyaniyekê de got: "Me rêyeke dûr û dirêj derbas kiriye, lê hîn helwestên cuda hene û divê em wan nêzîkî hev bikin."

Got jî: "Dê danûstandinên berfireh ji aliyê serokatiya konferansê ve li ser armanckirî budceyê, berî konferansa li Bakuyê bêne organîzekirin."

Di daxuyaniyê de hat gotin: Welatên pêşkeftî armanckirî ku salane 441 milyar dolar alîkarî bidin. Ji bilî wê, armanca wan e bi tevahî 1.1 trîlyon dolar ji hemî çavkaniyan berhev bikin."

bijardeyêke din ku helwesta

Yekîtiya Ewropî nîşan dide û armanckirî darayî ji bo rûbirûbûna guherîna keşûhewa li çar aliyê cîhanê datîne ku salane zêdetirî 1 trîlyon dolar e, di nav de veberhênana navxweyî û



neteweyetî û fînansekirina taybet.

Herwiha Yekîtiya Ewropayê banga beşdariya Çînê di fînansekirina nû ya armanckirî de dike. Çîn niha welatê herî mezin ê qirêj ê cîhanê ye û duyemîn aboriya herî mezin e.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî roja 01.12.2023 li bajarê Dubey beşdarî merasîma vekirina Lûtkeya Cîhanî ya Keşûhewayê (COP28) bû û ji aliyê Serokê Îmarat Şêx Mihemed Bin Zayid Al Nehyan û Sekreterê Giştî yê NY Antonio Guterres ve hatibû pêşwazîkirin.

Serokwezîr Mesrûr Barzanî li ser tora civakî ya "X" nivîsîbû: "Çareserîkirina guherîna keşûhewayê, pêwîstiya wê bi hewlên hevbeş heye."

Nêçîrvan Barzanî: Şoreşa Îlonê dengê doza rewa ya gelê Kurdistanê bû

Serokê Herêma Kurdistanê bi helkefta salvegera 63ê ya serhildana şoreşa Îlonê peyamekê parve dîke û tê de amajeyê dide, "Em bi rêz û şkodari şoreşa Îlonê libîr tînin."



Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî îro (Çarşem, 11.09.2024) bi helkefta salvegera 63ê ya serhildana şoreşa Îlonê ya mezin peyamek parve kir û tê de amaje da, "Em bi rêz û şkodari şoreşa Îlonê libîr tînin."

Nêçîrvan Barzanî herwesa got, "Şoreşa Îlonê bûye naveroka hizir û nasnameya neteweyî û niştîmanî û şkodariya hemî Kurdistanîyan û îradeya pûlayî ya gelê Kurdistanê."

Serokê Herêma Kurdistanê herwesa got, "Em tekezê li ser îradeya mukom a gelê Kurdistanê ji bo parastin û bidestxistina tevaya mafên wî yên destûrî û tebayî û bihevrebûna navbera hemî pêkhatiyên wî gelî dikin."

Tekista peyama Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî:

Di salvegera 63ê ya Şoreşa Îlonê ya mezin de, em Rêberê Şoreşê Barzaniyê Nemir û tevaya Pêşmergeyên qehreman û hemî wan têkoşeran libîr tînin ên ku hêz û dest û baskên şoreşê bûn û em bi rêz û şkodari bîranîna wan dikin. Silav ji bo canê wan ê pakij, silav li hemî xebatkerên wê serdema giran ku hêştî di jiyane de ne. Em daxwaza emirdirêjî û silametiye ji wan re dikin.

Şoreşa Îlonê ya mezin, ku şoreşa hemî gelê Kurdistanê bû bi hemî pêkhatiyên wê ve, bûye naveroka hizir û nasnameya neteweyî û niştîmanî û şkodariya hemî Kurdistanîyan û îradeya pûlayî ya gelê Kurdistanê ji bo berhingarbûna stem û dagirkariyê. Şoreş dengê zelal ê azadîxwazan û doza rewa ya gel û niştîmanekî bû ku pêxemetî azadiyê hemî qurbanî dan, bû itîrafa yekê ya fermî bi mafên gelê Kurdistanê û bingeha hemî destkeftiyên paştir.

Di demekê de ku em bi şanazî ve vî bîranîna pîroz dikin, em tekezê li ser îradeya mukom a gelê Kurdistanê ji bo parastin û bidestxistina tevaya mafên wî yên destûrî û tebayî û bihevrebûna navbera hemî pêkhatiyên wî dikin. Em pirinsîp û nîrxên bilind ên şoreşê ji xebat û têkoşan û destbermedanê diparêzin, pêxemetî azadî û demokrasiyê û bi hêvî û geşbînî heta em digihin serkeftinê û bichanîna xewna şehîdan, ber bi paşerojê batştir berdwam dibin.

Bilind û pîroz be bîranîna şoreşa Îlonê ya mezin, silav li bîranîna şehîdan Kurdistanê û silav li canê wan ê pakij.

Nêçîrvan Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê

Zêdebûna hejmona PKKê li parêzgehên başûr û naverast Îraq nîgeran kiriye

Wezîrê Bergiriyê yê Îraqê eşkere kir, "Li deverên başûr û naverast ên Îraqê, xelkî peywendî bi PKKê kiriye."



Wezîrê Bergiriyê yê Îraqê Sabit Ebasî di daxuyaniyêke rojnamevanî de ragehand, "Hikûmeta Îraqê ji ber berfirehbûna hejmona PKKê li parêzgehên başûr û naverast ên Îraqê nîgeran e, zanyar hene ku hin kes ji Semawe û Nasiriyeyê çûne nav rêzên PKKê."

Sabit Ebasî amaje jî da, "Em bizavê ji bo wê yekê dikin ku çawa me li ser dîrxistina metirsiya hêzên Kurdî yên Rojhilata Kurdistanê li sinoran bi Îranê re lihev kir, bi Tirkiyeyê re jî lihev bikin."

Li dû gotina Ebasî, Tirkiyeyê daxwaz kiriye ku çawa arêşeya hêzên Kurdî yên Rojhilatê Kurdistanê bi Îranê re çare kir, arêşeya PKKê jî bi wî awayî çare bikin.

Serok Barzanî: Şoreşa Îlonê doza rewa ya gelê Kurdistanê gelek pêngavan ber bi pêş ve bir

Serok Barzanî di salvegera 63ê ya Şoreşa Îlonê ya mezin de peyamekê parve dîke û tê de amajeyê dide, "Şoreşa Îlonê mezintirîn şoreşa seranserî û siyasî û çekdarî ya cemawerê Kurdistanê bû." Herwesa dibêje, "Şoreşa Îlonê doza rewa ya gelê Kurdistanê gelek pêngavan ber bi pêş ve bir."

Serok Mesûd Barzanî îro (Çarşem, 11.09.2024) di salvegera 63ê ya Şoreşa Îlonê ya mezin de peyamek parve kir û tê de got, "Şoreşa Îlonê mezintirîn şoreşa seranserî û siyasî û çekdarî ya cemawerê Kurdistanê bû, ji bo bergirîkirin û çespanîna mafên rewa yên gelê Kurdistanê." Serok Barzanî tekezî kir, "Şoreşa Îlonê bawerîbixwebûn ji bo mirovê Kurd vegeand û bû bingeheke bihêz a siyasî û rêxistinî û cemawerî ji bo berdwamiya xebata rizgarîxwaziya gelê Kurdistanê li dijî stem û dagirkariyê." Serok Barzanî eşkere jî kir, "Şoreşa Îlonê bi dastan û gernasîyên xwe û bi xweragiriya serkirdetî û Pêşmerge û cemawerê xwe doza rewa ya gelê Kurdistanê gelek pêngavan ber bi pêş ve bir û bû îlhambexşa xebat û têkoşanê ji bo qonaxên din ên xebata gelê Kurdistanê." Tekista peyama Serok Barzanî di salvegera 63ê ya şoreşa Îlonê de:



Bi navê Xudayê Mezin û Dilovan Şoreşa Îlonê ya mezin bi rêberiya Barzaniyê Nemir mezintirîn şoreşa seranserî û siyasî û çekdarî ya cemawerê Kurdistanê bû, ji bo bergirîkirin û çespanîna mafên rewa yên gelê Kurdistanê. Şoreşa Îlonê îrade û bawerîbixwebûn ji bo mirovê Kurd vegeand û bû bingeheke bihêz a siyasî û rêxistinî û cemawerî ji bo berdwamiya xebata rizgarîxwaziya gelê Kurdistanê li dijî stem û dagirkariyê.

Şoreşa Îlonê bi dastan û gernasîyên xwe û bi xweragiriya serkirdetî û Pêşmerge û cemawerê xwe doza rewa ya gelê Kurdistanê

gelek pêngavan ber bi pêş ve bir û bû îlhambexşa xebat û têkoşanê ji bo qonaxên din ên xebata gelê Kurdistanê.

Di salvegera 63ê ya serhildana şoreşa Îlonê ya mezin de, em bi hezaran silavan ji bo canê pakij ê şehîdên şoreşa Îlonê û hemî şehîdên Kurdistanê dişînin. Herwesa min rêz ji bo fedakarî û xweragiriya hemî wan Pêşmerge û xebatker û qehremanan heye yên ku şûntiliyên wan di wê şanaziya niştîmanî de diyar in. Wan qehremanan dîrok ji bo gelê xwe tomar kir û jiyana xebata her yek ji wan dersên xebat û xweragirî ne.

Hiqûqnasan ji bo Abdullah Ocalan bang li Konseya Ewropayê kirin

Rêxistinên maf û hiqûqê bang li Konseya Ewropayê ya ku biryara "binpêkirina mafê hêviyê" yê li hemberî Abdullah Ocalan girte rojeva xwe kirin ku Tirkiyeyê neçarî guhertinê qanûnî bike.

Komeleya Hiqûqnasên Ji bo Azadiyê (OHD), Komeleya Hiqûqnasên Hemdem (ÇHD), Komeleya Mafên Mirovan (İHD), Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TİHV), Weqfa Lêkolînên Civakî û Hiqûqî (TOHAV) û Komeleya Civaka Sivîlî di Sîstema Cezayê de (CİSST) têkildarî "binpêkirina mafê hêviyê" yê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Navenda İHD'ê civîna çapemeniyê li dar xistin. Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê ji bo "mafê hêviyê" yê Abdullah Ocalan bike rojeva xwe daxuyanî hat dayîn. Gelek parêzer û nûnerên sazîyan tevî civînê bûn.

Endama Navenda OHD'ê Ebrû Akkal li ser navê sazîyan daxuyanî da. Akkal bal kişand ser biryara "binpêkirina mafê hêviyê" ya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) ku di 18'ê adara 2014'an de der barê Ocalan de dabû û got ku li gel 10 sal bi ser biryarê re derbas bûne jî lê Tirkiyeyê ji bo encamên binpêkirinê ji holê rabike tu sererastkirinên yasayî nekiriye. Akkal da zanîn ku wê Komîteya Wezîran di meha Îlonê de civîna xwe li dar bixe û li ser biryara DEMM'yê ya ku der barê Ocalan, Kaytan, Gurban û Boltan de daye bisekine û dîsa Tirkiyeyê di ber çavan re derbas bike.

Akkal destnîşan kir ku Tirkiye ji bo bichanîna biryarên DMME'yê soz daye, lê belê berpirsiyariyên xwe yên der barê biryarên ku hatine dayîn de bi cih neanîne û got: "Tevî ku 10 sal derbas bûne jî di nav de serlêder jî hene bi hezaran girtî ji mafê xwe yê hêviyê bêpar mane. Ev rejîma cezakirinê ya ku bi eşkereyî binpêkirina biryarên DMME'yê ye, bi cezayên giran û tund re rû bi rû dimîne. Mixabin Tirkiye guhertin û tedbirên ku qedexeya serbestberdana bi şert a heyî jî holê rabike û binpêkirinê di nav de bi dawî bike, nake. Planên çalakiyê yên ku gelek caran amade kirine, her wiha di rapora xwe ya pêncemîn a ku pêşkêşî Komîteya Têkoşîna li dijî êşkenceyê ya Neteweyên Yekbûyî kiriye, nişan dide ku ew naxwaze rewşê sererast bike. Nîşanek eşkere ye ku Tirkiye bi lez û bez ji pabendbûna xwe ya bi demokrasî û hiqûqê dûr dikeve. Tirkiye normên gerdûnî yên mafên mirovan ji nedîtî ve tî û xwe jê dûr dike."



Akkal, da zanîn ku biryara "binpêkirina mafê hêviyê" dê bandorê li hezaran kesan bike û bang li rayedarên Tirkiyeyê kir ku tavilê li gorî biryarên DMME'yê û şîretên Komîteya li Dijî Êşkenceyê ya NY'ê tevbigere. Akkal, ji Komîteya Wezîran ev daxwaz kir:

*Têkildarî hejmara kesên heta niha bi cezayê muhebbeta girankirî hatine cezakirin, hejmara kesên her sal bi cezayê muhebbeta giran tînin cezakirin, salên biryarên tîkildarî mijarê teqez bûyî û hejmara salên kesên cezayê muhebbeta giran lê hatiye birin û girtîgehê de derbas kirine, weke daneyên îstatîstîkî ji Hikûmeta Tirkiyeyê bixwazin.

*Bang li Tirkiyeyê bikin ku ji bo guherandina qanûnê ku rê nadin di hinek sûcan de şertê berdana bikontrol bikeve meriyetê, gavan biavêje û di qanûnan de guherînan çêbike.

*Ji bo Tirkiye biryarên Ocalan 2, Kaytan, Gurban û Boltan bicih bîne bêhtir lêkolîn bikin û heke heta wê demê gavên şênber neyên avêtin, ji Sekreteryaya Komîteya Wezîran miswedeya biryara navberê bixwazin.

*Serokê Komîteya Wezîran an jî Sekreterê Giştî yê Komîteya Wezîran, di çarçoveya Deklarasyona Reykjavík de ji bo cîbicîkirina biryaran û xurtkirina guftûgoya siyasî ya bi muxatabên neteweyî re û ji bo tevdirên şexsî û giştî peywardar bikin ku ji rayedarên hikûmeta Tirkiyeyê re nameyan bişînin."

Piştî Akkal, Serokê Giştî yê TİHV'ê Metîn Bakkalci axivî. Bakkalci, wiha got:

"Mafên her kesî hene û nabe kesek rastî binpêkirinan were. Mijareke ewqas zelal û hewcehî bi dirêjkirinê nîne. Divê di qanûnan de guhertinên bînin kirin. Tu wateya israra di vî de nîne. Ev rewşa bi sala ye didome, nayê qebûlîkirin. Zû an jî dereng ev meseleye dê were çareserîkirin."

Serokê Giştî yê OHD'ê Serhat Çakmak jî bal kişand ser serlêdanên gelek sazîyên maf û hiqûqê yê tîkildarî Ocalan û wiha got: "Serlêdana me ji bo komîteyê kiriye; di esasê xwe de qonaxeke bê ka dê mekanîzma û sazîyên navneteweyî hebûna xwe ji dil bidomînin an na. Biryareke 10 sal berê hatiye dayin heye lê hêj di hiqûqa navxweyî de guhertinek nehatiye kirin. Ev jî guherandina qanûnê li ser hebûna wê sazîyê çêdike. Di mijara bichanîna biryarê de siyaseta navxweyî û hevsgiriyên navneteweyî diyarker in. İktîdar, bi neavêtina gavan re di polîtîkaya şer de israra dike û civakê hem ji hêla polîtîk ve hem ji hêla civakî dirizîne. Divê li gorî heqîqeta vî xakê gav bînin avêtin û çareserî bînin pêşxistin."

Sekreterê Giştî yê İHD'ê İbrahim Halil Vargun jî bal kişand ser PMME'yê û ev tişt anî ziman: "Divê li gorî peymanê tevbigerin. Tirkiyeyê taahûda wê daye lê li gorî peymanê tevnagere. Ev jî tê wê wateyê ku hiqûqê nas nakin. Heke girtiyek tenê rojekê jî hesta ku tu caran jî girtîgehê dernakeve bîjt, ev yek li dijî mafên mirovan û rûmeta mirovahiyê ye. Divê hikûmeta û daraz tavilê van biryaran bicih bînin. Em ê wê bişopînin."

Mesrûr Barzanî: Şoreşa Îlonê şoreşeke niştîmanî û tevalî ya Kurdistanê bû

Serokwezîr Mesrûr Barzanî peyamekê bi helkefta salvegera şoreşa Îlonê parve dike. Serokê



Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro (Çarşem, 11.09.2024) peyamekê bi helkefta salvegera 63ê ya şoreşa Îlonê parve kir û tê de ragehand, "Îro 63 sal bi ser serhildana şoreşa mezin a Îlonê re derbaz dibin, ku şoreşke niştîmanî û seranserî û tevalî bû, bi serkirdetiya rêberê me yê niştîmanî Barzaniyê Nemir."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî herwesa got, "Libîranîna şoreşa Îlonê libîranîna qonaxeke geş a xebata rizgarîxwaziya gelê Kurdistanê ye, pêxemetî mafên wê yên rewa û destbermedana ji bergirîkirina ji ax û xelkê Kurdistanê ye."

Tekestî peyama Serokwezîr Mesrûr Barzanî: Îro 63 sal bi ser serhildana şoreşa mezin a Îlonê re derbaz dibin, ku şoreşke niştîmanî û seranserî û tevalî bû, bi serkirdetiya rêberê me yê niştîmanî Barzaniyê Nemir.

Libîranîna şoreşa Îlonê libîranîna qonaxeke geş a xebata rizgarîxwaziya gelê Kurdistanê ye, pêxemetî mafên wê yên rewa û destbermedana ji bergirîkirina ji ax û xelkê Kurdistanê ye.

Nirxên bilind ên şoreşa Îlonê di çespendina dadperwerî û yekrêzî û yekgirtin û rawestiyana li beramberî stem û bêdadiyê de herdem îlhambexşên karkirina me ne, pêxemetî zêdetir xizmetkirina xelkê Kurdistanê û parastina destkeftiyên me yên niştîmanî.

Di salvegera şoreşa Îlonê de, em bi rêz û hurmeteke zêde xebat û têkoşan û qurbanîdana hemî Pêşmerge û têkoşerên tevlibûyîyên şoreşê ji hemî tex û pêkhatiyên cuda cuda yên gelê Kurdistanê libîrînin.

Silav li canê pakij ê şehîdên şoreşa Îlonê û tevaya şehîdên Kurdistanê.

Mesrûr Barzanî
Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê

PDK: Em pêşbînî dikin 20ê mehê bangeşeya hilbijartinan dest pê bike

Çavkaniyekê ji Dezgeha Hilbijartinan a Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) ragehand, "Em dîr dibînin



ku li roja 16.09.2024ê bangeşeya hilbijartinan dest pê bike, ji ber ku hêsta piroseya hûrbîniyê di lîsta kandîdan de berdeyam e."

Çavkaniyekê ji Dezgeha Hilbijartinan a Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) ji ajansa K24ê re eşkere kir, "Destpêka bangeşeya hilbijartinan ji bo roja 20ê mehê tê paşxistin." Tekez jî kir, "PDKê bi baştirîn awa xwe ji bo van hilbijartinan amade kiriye." Ji bo hilbijartinên Perlemana Kurdistanê, du milyon û 899 hezar û 578 kesên mafê dengdanê heye, ku du milyon û 683 hezar û 618 ji wan dengderên giştî ne û 215 hezar û 960 ji wan jî dengderên taybet in. Ji bo birêveçûna piroseya hilbijartinên gera şeşê ya Perlemana Kurdistanê, Komisyona Serbixwe ya Hilbijartinan a Îraqê hezar û 431 bingehên dengdanê amade kirine, ku hezar û 266 ji wan bingehên dengdana giştî ne û 165 ji wan jî bingehên dengdana taybet in. Biryar e li roja 18ê Mijdara îsal piroseya dengdana taybet û li roja 20ê Mijdarê jî piroseya dengdana giştî ji bo hilbijartinên gera şeşê ya Perlemana Kurdistanê bi rê ve biçin û Komisyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Îraqê li ser amadekariyan berdeyam e.

Pizîşkiyan Serok Barzanî vexwend Tehranê

Serokkomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan, Serok Mesûd Barzanî vexwend Îranê.

Serokkomarê Îranê Mesûd Pizîşkiyan doh çûbû Bexdaya paytexta Îraqê û bi Serokkomarê Îraqê Letîf Reşîd, Serokwezîrê Îraqê Mihemed Şiya Sûdanî re civiyabû.

Mesûd Pizîşkiyan vê sibehê li Balafirgeha Navneteweyî ya Hewlêrê ji aliyê Nêçîrvan Barzanî ve hat pêşwazîkirin.

Pizîşkiyan destpêkê li Ofîsa Serokê Herêma Kurdistanê bi Nêçîrvan Barzanî û Kabîneyê re civiya. Serokkomarê Îranê paşê bi Serok Mesûd Barzanî re jî civînek kir.

Serok Barzanî vexwend Tehranê Ofîsa Barzanî daxuyand ku Mesûd Pizîşkiyan bi awayê fermî Serok Barzanî vexwendiyê Tehrana paytexta Îranê.

Ofîsa Barzanî li ser civîna Serok Mesûd Barzanî û Mesûd Pizîşkiyan got:



"Her du aliyên bîr û rayên xwe yên li ser rewşa herêm û Îraqê anîn zimên.

Her wiha behsa girîngiya pêwendiyên siyasî, aborî û çandî yên Îran û Herêma Kurdistanê hat kirin."

Li gorî bernamêyê, dê Serokkomarê Îranê piştî temasên li Hewlêrê derbasî Silêmaniyê bibe.

Mesûd Pizîşkiyan dê li Silêmaniyê

gora Mam Celal ziyaret bike û bi Serokê Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê (YNK) Bafîl Talebanî re bicive.

Mesûd Pizîşkiyan 30ê Tîrmeha 2024an sonda yasayî xwar û bû serokkomarê nû yê Îranê.

Pizîşkiyan di yekem serdana xwe ya dîplomatîk a derveyî welat de doh çûbû Bexdayê.

Nûrî Çelîk: Milletê bê xwedî, welatê bê sermiyan

Li her çar parçeyên Kurdistanê rewşa me heman rewş e. Li derveyî Kurdistanê, li seranserê cihanê rewşa me heman rewş e. Ne dezgehek me ya yekgirtî heye, ne berdevkekî me heye, ne temsîliyeta me heye û ne jî nasnameyek fermî ku xelkên biyanî karibin me pê binasin û alîkariya me bikin heye. Ango, em li seranserê cihanê bê şivan in, bê sermiyan in, bê rêber û bê serwer in. Em bûne wek pezê serberdayî...

Dibêjin mala bê sermiyan wek pezê bê şivan e. Şivan û sermiyan tunebe herkes li gor serê xwe, li gor zanîn û nezanîna xwe bi vîrde û wêde dibeze û dibe sebebê serserîfî, kaos û anarşîzmê. Ji ber sermiyanê me tuneye, em Kurd wek millet di vîrde de ne. Sermiyanî jî helbet bi hebûna dewletê ve, bi hebûna zagon û makzagonên dewletê ve girêdayî ye. Ji ber em bê dewlet in, sermiyanekî me tuneye, zagon û makzagonên me tunene, herkes bi serê xwe sermiyanek e, herkes zagon û makzagona xwe li gor xwe û berjewendîya xwe çêdike û bi rê ve dibe. Ango, em bê serûber in, bê rêber û bê serwer in, bê xwedî û bê star in.

Li her çar parçeyên Kurdistanê rewşa me heman rewş e. Li derveyî Kurdistanê, li seranserê cihanê rewşa me heman rewş e. Ne dezgehek me ya yekgirtî heye, ne berdevkekî me heye, ne temsîliyeta me heye û ne jî nasnameyek fermî ku xelkên biyanî karibin me pê binasin û alîkariya me bikin heye. Ango, em li seranserê cihanê bê şivan in, bê sermiyan in, bê rêber û bê serwer in. Em bûne wek pezê serberdayî. Ji ber vî jî, jiyana endam û ferdên civaka Kurd her kêlî, her kat û wextê di xeterê de ye û tu misogerî jê re tuneye. Çi li welatê xwe û çi li derveyî welatê xwe, her demê dikare bê derdest kirin û radestî neyarê xwe bê kirin.

Heta îro li derveyî welatê, bi taybet li Ewropayê, bi dehan Kurdên siyasî û çalak radestî Tirkîyê hatine kirin. Hatine revandin, hatine kujtin û hatine bêdengkirin. Bi dehan Kurdên siyasî jî alî dewleta Îranê ve hatine kujtin û revandin. Bêdewletî, bêxwedî, bêsermiyanî encama vî malkambaxîyê ye. Hûn dev ji Ewropa û parçeyên ne azad berdin, li beşê azad jî, ango li Başûrê Kurdistanê jî êdî Kurdên siyasî yên parçeyên din, pêşmergeyên ku şerê dewletên dagîrker dikin û canê xwe dikin qurban, ne misoger in. Bi taybet endam û pêşmergeyên PDK Îran êdî li beşekî azad ê welatê xwe jî nikarin bisitirin, yan tîr radestî kirin, yan tîr kujtin. Başûra ku ji bo Kurdên beşên din bûbû stargeh (me wilo dizanîbû) û wargeha ewlekarîya jiyana wan, êdî bûye cîhê tirs û xofa radestîkirin û mirinê. Bi taybet YNK û Talebanî jî bo şelafiyê ji Tehranê re bikin û piştgirîya Îranê bigirin, bê şerm û fedî endam û pêşmergeyên PDK Îran radestî hêzên Îranê dike û berê wan dide mirinê.

Pêşmergeyê Rohhilatî Mistefa Selîmî 17 salan di zindanên rejîma Îranê de ma. Berî çar salan (2020) ji zindanê revîya û xwe li parçeyê azad (Başûrê Kurdistanê) girt. Ji ber Başûr jî bo Kurdan wek stargeh û ewle dihat dîtin, Mistefa Selîmî jî xwe avêt tor û bextê vî stargehê. Lê Selîmî nizanîbû ku stargeha me bûye navenda radestîkirina Kurdan û stargeha bêbextiyê. Di 2ê Nîsanê de Mistefa Selîmî derbasî Başûr bû û piştî demekê YNK ew radestî îstixbarata Îranê (İtlaat) kir û hat şeniqandin (darvekirin). Niha jî bêbextî û neyarîtiya li dijî Kurdên beşên din, bi taybet Kurdên Rohhilat, berdeyam e û bi radestîkirina endamê PDKî siyasatmedar Behzad Xusrewî ev bêbextî û xiyana li dijî Kurdan xwe dubare dike. Behzad Xusrewî penaberekî fermî û siyasîbû. Ne penaberekî qaçax û veşartî bû. Radestîkirina penaberekî fermî bi serê xwe sosret û rûreşiyek mezin e. Tew ku ew penaber bi destê Kurdan bê

radestîkirin, rûreşîya rûreşiyê ye.

Rejîma Îranê ji bo ku Kurdên Rohhilat, bi taybet endam û pêşmergeyên PDKî ji Herêma Kurdistanê derxe, wan radestî bigire yan bikuje, her tiştî dike. Herî dawî



Rayedarê Îranê Kazem Garîbabadî daxuyanîyek da ajansa mehr a nivfermî ya Îranê û diyar kir ku Wezaretê Karên Derve ya Îranê ji bo 118 siyasatmedarên Kurd, ku di nav wan de endamên PAK, Komale, PJAK û KDP-î jî hene, dosyayek radestî desthilatdarên Îraqê kiriyê.

Abadî herwiha eşkere kir ku di çarçoveya "Komîteya Hevbeş a Dadwerî ya Têkoşîna li dijî Terorê" ya di navbera Îran û Îraqê de, li dijî siyasatmedarên Kurd "kiryarek yasayî" hatiye destpêkirin. Abadî her wiha da zanîn ku daxwaza radestîkirina siyasatmedarên Kurd ên Rohhilat li gor "lihevkirina di navbera Komara Îslamî û Îraqê de hatiye kirin.


Li vir dixuye ku rejîma Îranê ji bo tunekirina siyasatmedan, endam û pêşmergeyên partiyên Kurdên Îranê hemû hewldanan dide û wê bide jî. Lê yak u me dêşîne helwest û bêbextîya YNK û bêdengî û bêhelwestîya PDK ye.

PDK bi bêdengî û bêhelwestîya xwe rasterast yan ne rasterast dibe şîrkê sîc û gunehên YNK û rejîma Îranê. Bêdengîya li hember radestîkirina pêşmerge û Kurdên siyasî Kurdan dêşîne, bi taybet dostên PDK zêdetir dêşîne. PDK bi vî bêdengî û bêhelwestîya xwe xwe di çavên Kurdên din de piçûk dixwe, bêqîmet dike û bahwerîya bi PDK dişikîne. Ne tenê bêdengî û bêhelwestîya li hember radestîkirina Kurdên Rohhilat û Îranê, bêdengîya li hember êrîş û bombekirinên Tirkîyê jî bi heman şeweyî dil û hasten Kurdan brîndar dike. Xaka Başûr tê dagîrkirin deng tune, gundên Başûr tîr bombebarankirin, deng tune, Kampa Penaberên Mexmûrê tê bombebarankirin, deng tune. Û gelek sedemên din. Yanî, PDK bi vî helwesta xwe, bi vî bêdengî û xemsarîya xwe li her çar parçeyên Kurdistanê gelek tişt û çeper wînda kirin, gelek Kurd ji xwe sar û dîr kirin. Divê PDK bizanibe ku Kurdistan ne tenê Duhok, Zaxo û Hewlêr e. Siyaseta ku di nav sînorên van her sê bajaran de teng û fetisî ye, tu fêdeyê nade PDK û dostên PDK. Dawîya siyaseta ku xwedî li Kurdên her çar parçeyî dernekeve lawazî û têkçûn e.

Werhasîlî kelam, em milletekî bê xwedî û welatekî bê sermiyan in. Sermiyanên heyî jî mixabin ne di wê astê de ne ku karibin sermiyanîyê ji her çar beşên Kurdistanê re bikin.

Wek dibêjin, mîh bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe. Comerdî û mîrxasî ew e ku meriv ne di rojên fireh de, di rojên teng de karibe xwedî li hev derkeve û hûn sax.....

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê encama serhildanên neteweyî ye...



İbrahim GUÇLU

Neteweya kurd, 200 sal e ku ji bona çarenivîsiya xwe û dewleta xwe ava bike xebat û têkoşîna millî dimeşîne. Dema ku Şoreşa Neteweyî ya Îlonê li Başûrê Kurdistanê dest pê kir, 150 sal bû ku têkoşîna neteweya kurd ji bona çarenivîsiya xwe dom dikir.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê, di sala 1961an de li ser bingeh û ceribandînan serhildan û têkoşîna neteweyî yên Kurdistanê qewimî.

Di Şoreşa Neteweyî ya Îlonê de, nefesa Serhildana Şêx Ubeydullah Nehrî, Mîrê Botan, Simko Axayê Şikakî, serhildana 1925an a di bin serokatiya Xalid Begê Cibrî û Şêx Seîd Efendiyê Pîranî de hatiye meşandin, Serhildana Agriyê ya ku di bin serokatiya Îhsan Nûrî Paşa de hatiye meşandin, heye.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê ji van hemû tevgerên millî û serhildanên millî sûd wergirt.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê encama ceribandînan, çanda Dewleta Kurdistanê ya Mehabadê ye

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê çawa ku encama xebat û têkoşîneke dîrokî û dirêj e; di heman dem de encama amadekariyê mezin e jî.

Ji bona Şoreşa Neteweyî ya Îlonê amadekariyê mezin hebû. Serok Mele Mistefa Barzanî û hevalên wî li Yekîtiya Sovyetan û di qada navneteweyî de xebatek xurt û bi plan meşandin.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê, ji şoreş û serhildanên Kurdistanê yên beriya wê, ji aliyê pêşengiyê de jî xwediyê ferqeke mezin bû.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê, di pêşengiya Serok Mele Mistefa Barzanî de hat meşandin. Ew serokê demê nebû. Ew serokê hemû deman bû. Ew di gelek şoreş û di avakirina Dewleta Kurdistanê ya Mehabadê de hatibû pijandin û bibû xwediyê ceribandînan. Ew beriya şoreşa millî ya Îlonê jî, her dem li pêş bû û serok bû.

Serok Mele Mistefa Barzanî, serokatiya xwe piştî Şoreşa Neteweyî ya Îlonê jî domand.

Loma jî Şoreşa Neteweyî ya Îlonê bi pêşengiya Serok Mele Mistefa Barzanî xwediyê şanseke mezin bû. Wê şansê bi serkeftinê û zora dijmin birinê û bi avakirina Otonomiya Kurdistanê xwe diyar kir.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê, ji şoreşên din yên Kurdistanê ji aliyê rêxistinî de jî xwediyê şans û ferqeke mezin bû. Yekemîn car bû ku şoreşeke millî ya Kurdistanê di

pêşengiya partiyekê (PDKê) de hat meşandin.

Pêşengiya partiyê, serokatiya Şoreşa Neteweyî ya Îlonê guhert. Bi wasitaya PDKê pêşengiya Şoreşa Millî ya Îlonê li Kurdistanê ji hemû berpîrsiyarên beşên civatê teşkîl kir.

Hemû şoreşên millî û serhildanên Kurdistanê li hemberî Împeratorî û dewletên kolonyalîst serkeftî nebûn. Li hemberî dewletan şikest xwarin.

Lê Şoreşa Neteweyî ya Îlonê di vê mijara stratejîk de qedera neteweya kurd guhert. Li hemberî dewletê serkeftî bû, zora dewletê û dostên wan Yekîtiya Sovyetê bir.

Dewleta Iraqê û desthilatdariya Baasê mecbûr bûn ku bi Şoreşa Millî ya Îlonê û Serok Mele Barzanî û PDKê re Peymana Otonomiya Kurdistanê di 11ê Adara 1970yî de bipejirîne.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê bi her awayî îradeya gelê Kurdistanê temsîl dikir.

Loma jî xwediyê taybetiyêke dîrokî bû.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê, şoreşeke civakî û gelemper bû. Hemû beşên kurdan; mîr, şêx, axa, serokeşir, mele, gundî, karker, rewşenbîr, jin, mêr, ciwan û kal, beşdar û piştgirê Şoreşa Neteweyî ya Îlonê bûn.

Loma jî şoreşeke gelek demokrat bû.

Şoreşa Neteweyî ya Îlonê domand, ji şoreşa millî ya gulane re derfet çêkir û bingeha Dewleta Federe ya Kurdistanê ava kir.

Mesrûr Barzanî: Eger îrade hebe, çareserkirina pîrsgirêkan hêsan e

Mesrûr Barzanî ji şandeya aboriyê ya Iraqê re got, "Eger îrade hebe, çareserkirina pîrsgirêkan hêsan e."



Civîna liqneya aboriyê ya Iraqê û Herêma Kurdistanê bi amadebûna Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî li Hewlêrê hat lidarxistin. Di civînê de Alîkarê Serokwezîr û serokê şandeya aboriyê ya girêdayî Serokwezîriya Iraqê Fuad Husên, Alîkarê Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Qubad Talebanî û gelek wezîr û berpîrsên pêwendîdar ên her du aliyên amade bûn.

Herwiha di civînê de her du alî li ser pîrsgirêkan ku heta niha nehatine çareserkirin axivîn û tekezî li ser rêzgirtina mafên destûrî yên Herêma Kurdistanê hat kirin.

Hikûmeta Herêma Kurdistanê li ser civînê daxuyaniyek belav kir.

Li gorî daxuyaniyê, Mesrûr Barzanî got, "Eger xwestek û îradeya çareserkirinê hebe, çareserkirina pîrsgirêkan hêsan e."

Divê rêzgirtina destûr û peymanan bibe bingeha çareserkirina hemû pîrsgirêk û nakokiyên." "Divê hikûmeta federal bibe hikûmeta hemû herêm û parêzgehan"

Herwiha Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî got:

"Divê hikûmeta federal bi awayekî dadperwerane li hemû parçeyên Iraqê tevbigere û bibe hikûmeta hemû herêm û parêzgehan."

Çawa ku parastina mafên hemwelatîyên Besra û Bexdayê dike, divê bi heman awayî parastina mafên gelê Herêma Kurdistanê jî bike." Mesrûr Barzanî tekez kir ku Herêma Kurdistanê herêmeke destûrî ye û wiha pê de çû:

"Divê rêz li sîstema federalî ya Herêma Kurdistanê bê girtin û di vê çarçoveyê de serederî bi Herêma Kurdistanê re bê kirin."

Di daxuyaniyê de hat ragihandkin ku Alîkarê Serokwezîr û Serokê Encûmena Serokwezîriyê ya Iraqê ya ji bo karûbarên aboriyê li ser giringî û pêwîstiya çareserkirina pîrsgirêkan nehatine çareserkirin li ser bingeha destûrê hev ra bûn û "hatina vê şandeya bilind ji bo çareserkirina pîrsgirêkan e."

Piştî komîteyên pêwendîdar ên her du aliyên bi awayekî cuda li ser mijaran civiyên û nîqaşên berfireh kirin.

Tê plankirin ku hevdiştin du rojan berdewam bikin.

Asayîşa Herêma Kurdistanê: YNKyê Behzad Xusrewî radestî Îranê kir

Encumena Asayîşa Herêma Kurdistanê got, "YNKyê Behzad Xusrewî radestî Îranê kir û haya Encûmena Asayîşa Herêma Kurdistanê ji vê yekê nîne."

Endamê Hizba Demokrat a Kur-

vê yekê nîne."

Di beşeke din a daxuyaniyê de Encumena Asayîşa Herêma Kurdistanê ragihand:

"Ev demek e Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê saziyên hikûmetê yên li

hatibû desteserkirin.

Di encama lêkolînê de derket holê ku mafê wî yê rûniştinê li Herêma Kurdistanê nîne û ti pêwendîya ve mijarê bi karê siyasî re nîne."

PDK-Î: Asayîşa Silêmaniyê endamê me radestî Îranê kir

Navenda Teşkîlata Hizba Demokrat a Kurdistanê - Îran (PDK-Î) li ser radestkirina Behzad Xusrewî daxuyaniyek belav kir.

PDK-Îyê di daxuyaniya xwe de got, "Di du hefteyên borî de Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê li Silêmaniyê du caran gazî Behzad Xusrewî kiriyê."

Cara duyemîn piştî cend rojan desteserkirî ma wan ew radesî Îdareya Îtlaata Bajarê Sineyê kir."

"Piştî şkenceyê hatiye radestkirin"

Behzad Xusrewî di sala 1987an de li Seqizê ji dayîk bûye û ji sala 2014an ve li Silêmaniyê dijîtiya û daxwaza mafê penaberiyê ya Neteweyên Yekbûyî hebû.

Li gorî Rêxistina Mafê Mirovan a Hangawê, Bahzad Xusrewî kesekî astengdar bûye û "piştî şkenceyê" radesî saziyên ewlehiyê yên Îranê hatiye kirin.

1ê Îlona 2024ê Hêzên ewlehiyê yên Sineyê pêwendî bi birayê Behzad Xusrewî yê ku li Seqizê dijî re kir û jê re got ku Behzad li bajarê Sineyê hatiye girtin û dê wê sewqî dadgehê bikin.



distanê - Îran (PDK-Î) Behzad Xusrewî 1ê Îlona 2024an radestî Îtlaata Îranê hatibû kirin.

Encumena Asayîşa Herêma Kurdistanê li ser radestkirina Behzad Xusrewî daxuyaniyek belav kir û got:

"Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê (YNK) li ser navê Asayîşa Silêmaniyê û bi fermana Serokê YNKyê endamê Hizba Demokrat a Kurdistanê Behzad Xusrewî radestî Komara Îslamî ya Îranê kiriyê û haya Encûmena Asayîşa Herêma Kurdistanê ji

Silêmaniyê bi biryara partiyê ve bi rê ve dibe.

Saziyên fermî yên Herêma Kurdistanê ji kiryarên neyasayî yên serokê YNKyê û saziyên wan berpîrs nînin."

Dezgeha Asayîşa Herêma Kurdistanê ya Silêmaniyê doh li ser Behzad Xusrewî daxuyaniyek belav kiribû û tê de wiha gotibû:

"Behzad Xusrewî hefteya borî ji ber nebûna destûra rûniştinê ji aliyê hêzên ewlehiyê yên Silêmaniyê ve

Mûsa Anter 32 sal berê wek îro hat qetilkirin

Di ser qetilkirina rojnamevan, rewşenbîr û nivîskarê Kurd Musa Anter (Apê Musa) re 32 sal derbas bûn. Mûsa Anter di 20ê Îlona 1992an de li Amedê hat qetilkirin. Kujer û qesas nehatin dîtin û dosyaya qetlîamê par bi hinceta demborîyê hat betalkirin.



Mûsa Anter di sala 1920an de li gundê Zivingê girêdayî Nisêbîna navçeya Mêrdînê di nava şert û mercên nebaş de hatiye dinyê. Bavê wî hê zarok bû mir. Navê bavê wî Anter bû navê malbata paşê. Bi diya xwe re mezin bû. Dibistana seretayî li Mêrdînê li dibistana şevînî xwend. Ev dibistanên nû yên şevînî ji bo baştir piştgirîkirina zarokên ku di şert û mercên xerab de mezin bûn tedbîrek nû bû. Dibistana navîn û amadeyî li Edeneyê xwend û heta sala 1941 li wir ma. Mûsa Anter piştî ji aliyê dewletê ve bi çend xwendekarên bijarte re şandin dibistana şevînî ya Stenbolê. Di dema xwendina xwe ya felsefeyê de gelek xwendekarên Kurd nas dike. Di nav wan de sekreterê giştî yê Partiya Karkerên Tirkîye Tarık Ziya Ekinci, damezrînerê Partiya Türkiye Milli (Partiya Netewî ya Tirkîyê) Yusuf Azizoglu û damezrînerê Partiya Demokrat a Kurdistanê-Tirkîye Faik Bucak jî hebûn. Paşê ji felsefeyê derbasî hiqûqê bû. Di 11ê Kanûna 1944an de bi keça karsazê mezin Abdurahim Zapsu re zewicî û du kur û keçek wî çêbû. Xebatên wî yên siyasî li zanîngehê dest pê kir. Ew ji bûyerên derveyî îlhama xwe girt. Di salên 1950î de ji Yêrêvanê û Qahîreyê weşanên radyoyê bi Kurdî hebûn. Lê ji bo Musa Anter a girîngtir şoreşa 1958an a Iraqê û vegera Mistefa Barzanî ji sirgûniya Sovyetê bû.

